# Dayik û bavên hêja,

**kîjan pîşe ya rast e?**
Bersiva vê pirsê dijwar e, lewre 320 pîşeyên ausbîldungê yên ku ji hêla dewletê ve tên nas kirin û ji 18,000 zêdetir kurs hene! Lê belê, tiştê teqez ev e ku dayik û bav şêwirmendên girîng in dema ku dor tê ser biryardana ji bo pîşe û / yan zanîngeha zarokên wan!
Bi zarokên xwe re riya meyla kariyerê û hilbijartina kariyerê bişopînin û her car piştgiriyê bidin wan û ji wan re bibin alîkar

Ev nexşe dê li ser derbasbûna ji dibistanê ji bo pîşeyê ve nêrînekê bide we. Randevuyên girîng û bijardeyên piştgiriyê nîşan dide.

Zêdetir agahiyên li ser mijara kariyerê û meyldariya xwendinê û her wisa materyalên ji bo daxistinê li virê peyda dibin: **www.kreis-euskirchen.de/koko**

## Perwerde û entegrasyon di bin banekî de: Navenda Perwerdehiyê û Entegrasyonê ya şaredariyê (KoBIZ) ya bajarê Euskirchenê

KoBIZ dezgeheke rêveberiya bajêr e. Qadên xebatê yên Midûriyeta Perwerdehiyê ya Herêmî (RBB), Navenda Entegrasyonê ya Şaredariyê (KI) û **Ofîsa Kordînasyonê ya Şaredariyê ya ji bo Derbasbûna ji Dibistanê ji bo Pîşeyê (KoKo) ya ji bo projeya dewletê ya "Bêyî peywendiyê Peyman nîn e" bi kurtî hatin vekirin.**
**KoKo navenda kontrolê ye ji bo pêkanîna pêvajoyên "Bêyî Peywendiyê Peyman nîn e".**
Ew ji bo herêmê motor e û ew aktoran û çalakiyên wan koordîne dike, yên wekî dibistan, dezgehên çavdêrîkirina dibistanan, Ajansa Kar, jûrên pîşeyî, dezgehên karkeran û yên kardaran û hwd. Armanca wê ew e ku bi hemû partneran re bixebite da ku derbasbûna ji dibistanê ji bo pîşeyê şexsî û li gorî hewcedariyên her xwendekarekî çêke.

**Kunye | Edîtor**
Ofîsa koordînasyona şaredariyê ya ji bo derbasbûna ji dibistanê ji bo pîşeyê li KoBIZ, navçeya Euskirchenê Navnîşana Posteyê: Jülicher Ring 32, 53879 Euskirchen Navnîşana serdanê: Georgstraße 1 • 53879 Euskirchen • Kontakt: Tel.: 02251 / 15 336 • Fax: 02251 / 15 985 • koko-euskirchen@kreis-euskirchen.de • www.kreis-euskirchen.de
Şablon/Xêz: Judith Maur Design
Rewş: Îlon 2020





Kreis EUSKIRCHEN
Einfach wohl fühlen!

# Nexşeya dayik û bavan

## Derbasbûna ji dibistanê ji bo pîşeyê

**OFÎSA KOORDÎNASYONÊ YA ŞAREDARIYÊ (KoKo)**
**LI KoBIZÊ DERBASBÛNA JI DIBISTANÊ JI BO PÎŞEYÊ**

Regionale Bildungsnetzwerke Nordrhein-Westfalen
KEIN ABSCHLUSS OHNE ANSCHLUSS
Kommunales Integrationszentrum Kreis Euskirchen
Mit finanzieller Unterstützung des Landes NRW und des Europäischen Sozialfonds
EUROPÄISCHE UNION Europäischer Sozialfonds
ESF in Nordrhein-Westfalen
Ministerium für Arbeit, Gesundheit und Soziales des Landes Nordrhein-Westfalen




## Nîşe:

① **Şêwirmendên pîşeyî** alîkarî û şîretan didin zarokan. Derbarê hilbijartina pîşeyê de agahiyan didin. Peywendiya şexsî bi gelek awayan pêkan e. Hûn dikarin ji vê telefonê 02251 / 797979 bi awayekî lezgîn û bêyî randevuyekê bi şêwirmendeke/î pîşeyî re biaxivin. Wekî alternatîv hûn dikarin E-Maîlekê bişînin vê navnîşanê: Bruehl.Berufsberatung@arbeitsagentur.de Agahiyên bi hûgilî û nû li ser vê malperê peyda dibin www.arbeitsagentur.de/bildung

② **Check-U**, portala xwekişfkirinê ya Ajansa Kar di hilbijartina pîşeyê de alîkariyê dide xwendekaran. Check-U li gel vê ji bo peydakirina karekî li gorî meyl û şiyanên we alîkariyê dide. Ji ber ku li saya vê amûrê xwendekar taybetmendiyên xwe yên şexsî û şiyanên xwe çêtir nas dikin û ji bo wan profîla şiyanan ya şexsî tê afirandin. Hûn dikarin vê bi xwe re bibin hemû randevuyên şêwirmendiya pîşeyî. **www.arbeitsagentur.de/ selbsterkundungstool**

③ Portala **planet-beruf.de** bi taybetî ji bo şagirtên dibistana navîn e. Ez û dayik û bavên wan. Derbarê ausbîldungê û hilbijartina pîşeyê de gelek şîretan û agahiyan pêşkêş dike. Di beşa "Perwerdehiya Serlêdanê" de gelek agahî, temrîn, vîdyo, podcast û her wisa rûpelên xebatê û lîsteyên kontrolê hene. Portala **www.abi.de** bi van mijaran ji bo şagirtên dibistana navîn e. II. Appa belaş "Bewerbung: Fit fürs Vorstellungsgespräch" Her kesî bi awayekî taybet ji bo hevdîtinên xwenasandinê amade dike. www.planet-beruf.de

④ **BERUFENET** a Ajansa Kar (Agentur für Arbeit) derbarê gelek beşên ausbîldungê û pîşeyên zanîngehê de agahiyên berfireh pêşkêş dike. Hûn dikarin riya sê kategoriyên cuda (Qadên pîşeyî, Qadên xebatê yan Qadên perwerdehiyê) li karekî taybet bigerin. Li gel agahiyên giştî yên li ser pîşeyê yan têketina dibistanê, agahdariyên li ser naverokên taybet, aliyên darayî yan jî hêviyên dahatûyê jî têne pêşkêşkirin.www.berufenet.arbeitsagentur.de

⑤ Agahiyên li ser ausbîldunga li IHKê ûborseya ausbîldungan ya IHKê û Jûra Pîşesaziyê li ser van malperan peyda dibin:

www.hwk-aachen.de www.hwk-aachen.de/lehrstellenboerse www.aachen.ihk.de www.ihk-lehrstellenboerse.de